# Mereqa li ser Zirafê

Nivîsîna: Îngegerd û Zetterlund
Wêne: Yohanna Zetterlund
Wergera ji swêdî:: Xelîl Duhokî

Temaşay jor bike!
Em zirafe, bilindtirîn candarên cîhanê, ji vêre têyin. Navê min twîgaye û bi tinê têşkekî biçûkim, lê digel hindê jî, ez bi qasî mirovekê xort dirêjim. Piştî çend salên dî, ez bi qasî xanîyekî bilindim. Wî çaxî, pên min hind dirêjin, ku dîya te yan jî babê te, dikarin, bi bijina xo di bin zikê min re biçin!
Tiştekî baş e ku wesa dirêj bî. Çi tiştê li dorûber rû bide, mirov dikare bibîne. Her wesa zellim ji hemû candarên dî pêtir dikare bigehe bilindahyê, heta wê bilindahîya ku xwarina xoş ya me lêye, ku belgên gopîtka vê dara rast û bi stirî ye. Em di rêya zimanên xo yên dirêj de, belgên daran jê dikîn, bêyî ku xo li stirîyên tûj bidîn.
Nexoşe dema serê te pir li bilindahyê be; av gelek li jêre! Dema em têhinî dibîn û me bivê avê vexoyin, divê em destên xo jêk vekîn da ku devê me bigehe avê.
Eve sergêjî ye!
Demê mirovî ev pên dirêj hebin, paldan jî ne sanahî ye. Em piranî ji pêya ve dirawesitîn .Çaxê dayik zarokan dibin, ew ji pêya ve dirawestin û zarok rast dikeve ser erdî. Piştî çend çirikeyeka, zirafa ji dayikbûyî, dikare rabe ser pên xo yên sist û lawaz.
Dibe tu hizir bikî ku çewan em hevdu nas dikîn, çinku em hemû Xalidarîn û wek hevîn. Lê eger tu hûrik temaşayî me bikî, hîngê dê bînî ku me nexşên cuda hene. Em zû wê cudahyê destnîşan dikîn. Her wesa em bi sanahî dikarîn hevdu bi bêhnê jî binasîn. Çavên xo bigire û xo taqî bike, hîngê tu dê zanî!
Em li wêderê dijîn, li ser wan deşt û mêrgên efirîqayê, hejmareka zûr ya candarên cuda li wêderê dijîn. Kerekîvî, fîlê qelew û mezin, xezala şaxdirêj ya rind û şêrê bi tirs. Carina xelk bi tirumbêla têne vêderê, da ku temaşayî me bikin û wênan jî bigirin. Kî dizane, dibe tu jî demê mezin dibî, bi mêvanî bêye vêderê.
Ez û deyka xo bi roj diçîne ser girekî bilind. Em ji wêderê deyik û zarokên dî dibînîn. Her wesa em dikarîn li wêderê bimînîn û wek baxçekê zarokan bikar bînîn û bilîzîn. Deyik diçin da ku xarinê peyda bikin û têr bixon. Lê ew gelek dûr naçin, çinku ditirsin ku şêrek bi dizî bêt…nirrr, ew çi bû!?
Deyik bi lez vedigerin da ku me zarokan biparêzin. Ew li ser rêya wî şêrî dirawestin, ku bi dizî tête ser mêrgê. Şêr dizane ku zirafên mezin, dikarin pênên bi hêz bihavêjin. Her wesa ew bi stûyên xwe yên dirêj, dikarin dijminî rateqînin. Piştî bêhnekê, şêr rêya xo digire û diçe û em zarokên zirafan jî, rizgar dibîn.
Carina babên me, hevirikyê dikin, ka kîjan ji yê dî bi hêztir û mezintir e. Wî çaxî ew xo lêk didin û stûyên xo yên dirêj, paş û pêş dibin û lêk dalînin, hewil didin êkûdu bigirin. Bi wî rengî, demekê dirêj bi hev re şer dikin, ta ku yek ji wan bêtaqet dibe û xo bi dest ve dide.
Dema deyik û bab, evîna xo nîşa didin, hîngê stûyên xo bikar tînin. Lê bi dilovanî û bi hişîyarî lêk dalînin û li gor rêbaza zirafan, hevdu himbêz dikin.
Hin balndeyên biçûk, dostên me yên hêja ne. Em ji bo her cihî biçîn, ew digel me ne û çermên laşên me paqij dikin. Mîna mêryên çalak bi ser stûyên me de, diçin û tên û wan mêş, pêşî û adyên ku me digezin dixon.

Te dizanî ku em zirafe hema bêje nanivîn? Carina ji bo demekê kêm nebe. Eger em wesitîyayin, hîngê xo dirêj dikîn û stûyê xo jî, ji bo paş ve dibîn û serî didanîne pişt çokekê xo.

Xeweka xoş!